

AMNESTY INTERNATIONAL

DAXUYANÎYA ÇAPEMENÎYÊ

Sûriye: Bi erdê re rastkirina gundan a hevalbendên DYA sûcên şer pêk tînin

Amnesty International di raporeke îro weşandî de weha got: Mîsyoneke dîtina rastîyan bo bakurê Sûriyê, pêleke jicîhûwarkirina bi darê zorê û rûxandina xanîyan dîyar kiriye ku sûcên şer pêk tîne; ew ji aliyê Birêvebirîya Xweser a bi serkêşîya partîya sîyasî ya Kurdên Sûriyê, Partîya Yekîtiya Demokrat (PYD) a ku herêmê kotnrol dike, hatiye pêkanîn. Birêvebirîya Xweser li erdê hevalbendekî serekî yê koalîsyona bi serkêşîya DYA ye, ku li dijî koma çekdar a ku ji xwe re dibêje Dewleta Îslamî (DÎ) li Sûriyê şer dike.

'Cîhekî me yê din tunebû ku em biçûnaye': Bi darê zorê ji cîh û war kirin û rûxandinên li bakurê Sûriyê delîlên xerabkarîyên tirsnak dîyar dikin, ku di nav wan de hesabên şahidan û dîmenên satelîtî hene, ku li herêmên di bin kontrola Birêvebirîya Xweser de, pirê caran ji bo bersivkirina sêpatî yan têkilîyên şikkirî yê bi endamên DÎ yan komên din ên çekdar re, bi zaneyî jicîhûwarkirina bi hezaran sîvîl û bi erdê re rastkirina tevaya gundan bi hûrgilî dide.

Lama Fakiha Şewirmenda Bilind a Amnesty International weha got, "Bi rûxandina malên sîvîlan a bi zaneyî, di hin rewşan de bi erdê re rastkirin û şewitandina tevaya gundan, bêyî sedemên rewşa yê leşkerî jicîhûwarkirina rûniştîyên wan, Birêvebirîya Xweser rayedarîya xwe xerab bi kar tîne û bi êrîşên ku sûcên şer pêk tînin, qanûna mirovhezîyê ya navneteweyî bêşerm piştguh dike."

"Di şerê xwe yê li dijî DÎ de, xuya dibe ku Birêvebirîya Xweser mafên sîvîlên ku di navberê de asê mane, seranser bînpê dike. Me jicîhûwarkirin û rûxandina berfireh dît, ku ji ber şer pêk nehatibû. Ev rapor delîlên zelal raber dike, ku li gundên ku berê ketibûn destê DÎ, ku li wir ji hindikahîyeke piçûk dihat şikkirin ku piştvanîya wê komê dikirin, bi kampanyeke koordînekirî ya bi zaneyî cezakirina kolektîv a sîvîlan pêk hatiye."

Hin sîvîlan got ku gef li wan hatin xwarin ku heke terk nekin, ew ê bibin armanca lêdanên hewayî yê koalîsyona bi serkêşîya DYA.

Lêkolîvanên Amnesty International di Tîrmeh û Tebaxa 2015an de çûn serdana 14 navçe û gundên li parêzgehên el Heseke û el Reqqa, da ku bi darê zorê jicîhûwarkirina rûniştîyan û rûxandina xaniyan a li herêmên di bin kontrola Birêvebirîya Xweser de lêkolîn bikin.

Dîmenên satelîtî yê ji aliyê Amnesty International bidesxistî, berfirehiya rûxandinên li gundê Husênîya yê li bejahîya Til Hamîs raber dike. Dîmen nîşan didin ku ji 225 avahiyên di Hezîrana 2014an de li ser lingan bûne, di Hezîrana 2015an de tenê 14 mane – kêmbûneke şokkir a %93.8.

Di Sibata 2015an de, başkê leşkerî yê Birêvebirîya Xweser, YPG (Yekîneyên Parastina Gel), herêma ku ketibû bin destê DÎ, xist bin kontrola xwe û dest bi rûxandinan û jicîhûwarkirina gundîyan kir. Lêkolîvanên ku çûn serdana Husênîya bermayên xaniyên rûxandî dîtin û bi şahidan re hevpeyvîn pêk anîn.

Şahidekî weha got, “Em ji malên me kişkişandin derve û dest bi şewitandina wan kirin ... bûldozer anîn... Heta ku tevaya gund hat wêrankirin, xanî bi xanî rûxandin.”

Li gundên li başûrê navçeya Suluk, hin rûniştîyan got ku şervanên YPGê ew bi piştevanîya DÎ sûcdar kirin û gef li wan xwarin ku heke terk nekin, ew ê guleyan bera wan din. Teva ku rûniştîyan qebûl kir ku di hin rewşan de mistek piştevanên DÎ li gundên wan hebûne jî, piraniya wan ne piştevanên komê bûn.

Di rewşên din de, gundîyan got ku şervanên YPGê ferman da wan ku terk bikin, gef li wan xwarin ku heke nekin, ew ê bibin armanca lêdanên hewayî yê koalîsyona DYA.

Rûniştîyekî, Safwan, weha got, “Wan ji me re got ku divîya me terk bikira, an na wan ê ji koalîsyona DYA re bigota ku em terorîst bûn û firokên wan ê li me û malbatên me bidana.”

YPGê got ku ew ji bo parastina sîvîlan bi xwe pêwîst bû, yan pêwîstîyeke leşkerî bû, ku jicîhûwarkirina bi darê zorê bi heq dikir.

Lama Fakih weha got, “Pir girîng e ku koalîsyona bi srekêşiya DYA ya ku li Sûriyê li dijî DÎ şer dike û hemû dewletên din ên ku piştevanîya Birêveberîya Xweser dikin, yan pê re koordînasyona leşkerî dikin, çavên xwe ji xerabkarîyên weha re negirin. Divê ew bi awayekî eşkere, jicîhûwarkirina

bi darê zorê û rûxandinên neqanûnî rûreş bikin û bi cîh bikin ku alîkarîya wan a leşkerî li bînpêkirinên qanûna mirovhezîyê ya navneteweyî zêde nekin.”

Di êrîşeke bi taybetî hovane de, şervanên YPGê petrol rijandin ser xanîyekî, gef xwarin ku teva rûniştîyên li hindur êgir pêxin.

Bassma weha got, “Dest pê kirin ku ardû birijînin ser xanîyê xezûrê min. Xwesûya min li wir bû, qebûl nedikir ku terk bike û hema ew li dora wê rijandin ... Femandar operasyon bi rê ve dibirin ... Wan xezûrê min dît û dest pê kir ku li destê wî bixin ... Min got, ‘Heke hun xanîyê min bişewitînin jî, ez ê konekî bînim û li vir vekim. Ev cîhê min e. Ez ê li cîhê xwe bimînim.”

Her çend piranîya rûniştîyên ku van kirinên neqanûnî tesîr lê kirine Erebb û Tirkmen bin jî, di hin rewşan de, wek mînak li navçeya tehvlîhev, Suluk, YPG û Asayîşê, hêza polîs a Birêvebirîya Xweser, nehiştine rûniştîyên Kurd jî vegerin malên xwe. Wekî din, wek mînak li gundê Abdî Koy, hejmareke piçûk a rûniştîyên Kurd jî ji aliyê YPGê ve bi darê zorê hatine jicîhûwarkirin.

Di hevpeyvîneke li gel Amnesty International, serokê Asayîşê qebûl kir ku sîvîl bi darê zorê hatine derxistin, lê belê ev wek “bûyerên awarte” bi nav kirin. Berdevkê YPGê pircar îdia kir ku sîvîl ji bo ewlehîya wan bi xwe hatine derxistin.

Lê belê, gelek rûniştîyan got ku teva ku gundên wan ne cîhên pevketinan bûn, yan ji enîya şer dûr bûn û xetereke pêwengên teqînek ên çêkirî yên ku DÎ bi cîh kiribûn tunebû jî, zor dan wan ku terk bikin. Bêyî mecbûrîna şer, bi darê zorê derxistina sîvîlan, bînpêkirineke qanûna mirovhezîyê ya navneteweyî ye.

Lama Fakih weha got, “Divê Birêvebirîya Xweser rûxandina malên sîvîlan tavilê rawestîne, zirara hemû sîvîlên ku malên wan neqanûnî hatine rûxandin tezmîn bike û bihêle ku sîvîl vegerin û ji nuh ve ava bikin.”

Dokumenta Gelêrî

Index: MDE 24/2651/2015

Ji bo bêtir agahîyê ji kerema xwe telefonî nivîsgêha çapemenîyê ya Amnesty International li London, KY bikin:

+44 20 7413 5566 an +44 (0) 777 847 2126

email: press@amnesty.org

twitter: [@amnestypress](https://twitter.com/amnestypress)

International Secretariat, Amnesty International, 1 Easton St., London WC1X 0DW, UK